QULIXKIRINA MEYE PADŞATIYÊ

GULAN 2015

TÊMA VÊ MEHÊ: Alî hemû meriya bikin, wekî rastiyê nas kin (1 Tîmt. 2:3, 4).

HEFTYA JI 11 GULANÊ

Kilama 16 u Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
fg Serê 7 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 2 Samûyêl 4-8 (8 deqe)
№ 1: 2 Samûyêl 6:14-23 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Pey Mirinêra Çi Diqewime? (*igw* rûp. 18 abz. 1-3) (5 deqe)
№ 3: Serhatî 101 (*my*) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 40
10 deqe: Alî Hemû Meriya Bikin, wekî Rastiyê Nas kin. Gotar li ser hîmê têma vê mehê. (Binihêre "Birca Qerewiliyê" ya 15 Teşrînê, sala 2013, rûp. 11-12, abz. 8, (ru).) Bixûne û şêwir bike 1 Timotêyo 2:3, 4 û 1 Korintî 9:19-23. Dîna xwe bide li ser hine parêd Civata Qulixiyê ya vê mehê, û kifş ke ku çawa ev par, têma mehêva grêdayî ne.
20 deqe: "Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Şedetîkirin wan Merivara, yêd ku li ser Zimanê Din Xeber Didin". Şêwirkirin. Temaşa kin nîşan ke wekî rêalîstî be û kîderê ku mizgîndar dide xebatê broşûra "Mizgîniya Xwedê seva Merivêd ji Hemû Mileta", seva ku şedetî bide wî merivîra, rastî kîjanî ku ew hat wedê dannasînkirina mal bi mal.
Kilama 15 u Duakirin

Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Şedetîkirin wan Merivara, yêd ku li ser Zimanê Din Xeber Didin

Ev Yek Çira Ferz e: Seva Yahowa gelek ferz e wekî merivêd ji "her miletî", ruhanîda halxwaş bin (Kar. Şand. 10:34, 35). Xêncî wê yekê Îsa gotibû ku mizgîniya xêrê "li nav temamiya dinyayê", û "hemû miletara" vê bê dannasînkirinê (Met. 24:14). Zekeriya pêxembertî kir, wekî merivêd ji her zimanî û miletî, wê mizgîniyê qebûl kin (Zeker. 8:23). Li gora dîtinoka Yûhennayê şandî, ew merivêd ku ji roja tengasiya mezin wê xilaz bin, ewana jî wê "ji her miletî, ji her berekê, ji her cimetê û ji her zimanî" bin (Eyan. 7:9, 13, 14). Lema jî hergê em mihala xweda rastî merivekî usa tên, yê ku li ser zimanê din xeber dide, em gerekê bixebitin ku şedetî bidin.

Çawa Bikin:

- Pêşda xwe hazir ke. Bira çentê teda timê ew broşûra hebe, "Mizgîniya Xêrê seva Merivêd ji Hemû Mileta". Pêşda bixûne rêberiya ku destpêka broşûrêda ne, bi navê "Çawa Alî Wan Bikin, Kî ku li ser Zimanê Din Xeber Didin". Pêbihese ku meriv li ser çi zimanî xeber dide, û li ser haceta xweye elektronîk, ji jw.org bide kişandinê vîdêo yan jî edebyetê li ser zimanê wî. Bide xebatê programa "JW Language", seva ku hine xebera li ser zimanê wî merivî hîn bî. Diqewime mihala teda hine civat li ser zimanê din derbaz dibin û li ser wan zimana jî di vê têrîtoriyêda dannasîn dikin. Çi jî hebe çaxê tu mal bi mal dannasîn dikî, gerekê tevî xwe, tenê li ser wî zimanî edebyeta hildî, ser kîjanî ku civata te derbaz dibe. Lê çaxê tu dannasîn dikî li wan ciya, kîderê ku gelek meriv top dibin, hingê tu dikarî tevî xwe hildî edebyeta li ser çend zimana, li ser kîjanî ku zanî wekî ew meriv dikarin wê derê rastî te bên.
- Çaxê tu rastî merivekî têyî, yê ku li ser zimanê din xeber dide, tu dikarî derheqa "kirêd Xwedêye mezin", li ser zimanê wî, wîra gilî kî (Kar. Şand. 2:11). Dîna wî merivî bide li ser jw.org, seva ku ew hê zêde elametî li ser zimanê xwe bivîne. Hergê meriv hewasa xwe dide kifşê, hingê bê eglekirin tije ke blanka lazim (S-43), û bide sêkrêtar. Ewî merivî nehêle, heta mizgîndarêd ku li ser zimanê wî xeber didin, rastî wî bên.

Evê Yekê vê Mehêda Bide Xebatê:

- Wedê Qulixkirina Xweye Tevî Malbetê, temaşê hazir kin, ku çawa hûn şedetî didin wî merivîra, yê ku li ser zimanê din xeber dide.

 © Wachtturm Bibel- und Traktat-Gesellschaft der Zeugen Jehovas, e.V., Selters/Taunus

HEFTIYA JI 18 GULANÊ

Kilama 19 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
fg Serê 8 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 2 Samûyêl 9-12 (8 deqe)
№ 1: 2 Samûyêl 10:13–11:4 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Tenê Ewêd ji Endemêd Bedena Îsa wê Herine li Ezman, yêd ku Hatine Bijartinê (*td* 14B) (5 deqe)
№ 3: Çi Guman Heye Derheqa Miriya? (*igw* rûp. 19 abz. 1-3) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 25
10 deqe: Çawa Pawlos Alî Yûnaniya Dikir, ku Rastiyê Nas kin. Şêwirkirin. Bira bixûnin Karêd Şandiya 17:22-31. Şêwir ke, ku çawa ew serhatî dikare di qulixkirinêda, alî me bike.
20 deqe: "Yahowa wê Alî Te Bike, ku Mêrxas bî". Şêwirkirin. Vêxe vîdêoya "Yahowa Wê Alî Te Bike, ku Mêrxas bî". (Bikeve jw.org, û binihêre HÎNKIRINÊD KITÊBA PÎROZ > ZAR.) Bêje guhdara bira caba xwe bidin û bêjin, ku çi ders ewana ji vê vîdêo seva xwe hîn bûne. Bêje zara yêd ku di mektebêda hîn dibin, wekî caba xwe bidin û bêjin, ku çawa ev vîdêo alî wan kir, bi mêrxasî hevalêd xwera û dersdarara şedetî bidin. Bi temaşê nîşan ke qewimandinekê, ku çawa zar di mektebêda şedetî dide.
Kilama 23 û Duakirin

HEFTIYA JI 25 GULANÊ

Kilama 49 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
fg Serê 9 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 2 Samûyêl 13-15 (8 deqe)
№ 1: 2 Samûyêl 13:34-14:7 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Kitêba Pîroz Derheqa Xebatê Çi Dibêje? (*igw* rûp. 20 abz. 1-3) (5 deqe)
№ 3: Jîyîna Heta-Hetayê, yêd Mayînra Hatiye Sozdayînê, Dêmek "Pezêd" Dinra (*td* 14C) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 53
10 deqe: Qisekirina Berpirsiyarê Koma Dannasînkirinê. Çi dikeve nava şixulê te? Çawa dannasînkirinêda, tu alîkariyê didî xûşk-birêd koma xwe? Çima ferz e, wekî qulixkar tera bêjin derheqa guhastina adrês û hejmara têla xwe? Çima rûspî başqe-başqe derbaz dikin civatêd seva dannasînkirinê, dewsa ku tevayî avayîkêda top bin?
20 deqe: "Alî Kora Bike, ku Pêbihesin Derheqa Yahowa". Pirs û cab. Temaşê nîşan ke.
Kilama 44 û Duakirin

Alî Kora Bike, ku Pêbihesin Derheqa Yahowa

[1] Heta mirina Îsa çend roj mabû. Çaxê ew ji şeherê Erîhayê derdiket, du merivêd kor yê ku pars dikirin, kirine gazî: "Xudan, . . . li me were remê". Rast e Îsa zanibû wekî çetnayîke giran hîviya wî ye û ew ça barekî giran ser dilê wî bû, lê ew yeke sekinî, gazî wan du mêra kir û ew qenc kirin (Met. 20:29-34). Lê ça em dikarin çev bidine remtiya Îsa, hindava merivêd korda?

1. Çawa Îsa remtiya xwe hindava merivêd korda, da kifşê?

[2] **Alîkariyê Bide:** Hergê tu rastî merivekî kor hatî, pêşiyê nasiya xwe bide wî, û bipirse ku çawa dikarî alîkariyê bidî. Gelek car merivêd kor dikevine bin şikê, çaxê kesek dixwaze alîkariyê bide wan. Lê hevalhizî û helaliya me, dikare nihêrandina wan hindava meda biguhêze. Bîr neke wekî korbûna meriya, bi cûre-cûre ye û bi wê yekê tu dikarî têderxî ku çi alîkarî dikarî bidî wî merivî. Paşî wê yekê çaxê te got ku hazir î alî wî bikî, dikarî usa jî bêjî, wekî tu Kitêba Pîroz meriya hîn dikî. Û dikarî hine rêzêd ji Kitêba Pîroz wîra bixûnî, mesele

2. Çaxê em dannasînkirinêda rastî merivê kor tên, çawa em dikarin şedetî bidinê?

© 2015 Christian Congregation of Jehovah's Witnesses.
Druck und Verlag: Wachtturm, Selters/Ts. Printed in Germany

Zebûr 146:8 yan Îşaya 35:5, 6. Tu usa jî dikarî alî wî bikî, ku ew ji jw.org faylêd aûdîo xwera bide kişandinê. (Binihêre çargoşê “Çaxê Alîkariyê Didî Merivê Kor . . .”).

3 **Bivîne Merivêd Kor:** Wedê dannasînkirina mal bi mal, gelek car merivêd kor rastî me nayên, çimkî geleka ji wan xwe hêsa texmîn nakin seva ku xeber din tevî merivêd nenas. Bi rastiyê jî lazim e qewatê bidine xebatê, seva ku merivêd kor “bibînin” û bikaribin şedetî bidine wan (Met. 10:11). Diqewime merivê kor tevî te dixebite yan jî hîn dibe. Gava pêşin tu bavêje, ku wîra xeber dî. Tu kesekî nas dikî, cem kîjana ku neferêd malêye kor hene? Dibeke di mihala teda organîzasyonek heye, ya ku alîkariyê dide merivêd kor, yan jî hine xaniyêd usa saz dikin, kîderê ku merivêd kor dimînin. Şiroveke neferêd malbetêra, merivê ku ber derê wî xanî rûniştiye, yan mezinê wî xanîra, wekî Şedêd Yahowa gelek dixwazin aliyê merivêd kor bikin, û wanara aûdîo nivîsara bînin. Ji Kitêba Pîroz wî merivîra nîşan ke, ku Xwedê soz dide, wekî zûtirekê ewê çevêd kora weke. Çaxê tu nêta hatina xwe dibêjî, ev yek dikare mecalê bide te ku bikaribî tevî merivêd kor destpêkî xeberdanê.

4 Xûşkeke kor bi navê Janêt çûbû wî xanî, kîderê ku merivêd kor dijîtin. Evê xûşkê destpêkir xeberdan tevî kulfeteke cahil. Janêt gote wê, “Îsa yêd kor qenc dikir, seva ku nîşan ke wekî li axiriyê ewê çi bike seva hemû merivêd kor”. Wana tevayî şêwir kir Eyantî 21:3, 4 û Janêt şirovekir ku çawa ew soz, bi saya Padşatiya Xwedê wê bê sêrî. Kulfet hine arxayîn bû û got: “Min tucar nihêrandina usa ji merivê kor nebihîstiye. Gelek merivêd ku dikarin bivînin, divêjin ku meriv lema kor dibin, çimkî ewana yan jî kal-bavêd wan, tiştekî nerast kirine”. Janêt bi êmaîlê ewê kulfetêra lînk şand li ser kitêba “Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?”. Û niha ewana heftiyê du cara tevayî Kitêba Pîroz hîn dibin.

5 Rast e em nikarin merivêd kor qenc kin çawa ku Îsa dikir, lê em dikarin alî wan hemûya bikin, ser kîjana ku xudayê wê dinyayê, şewereşa kora aniye ser femê wan. Em usa jî dikarin alî merivêd kor bikin, ku rastiya ji Xebera Xwedê fem bikin (2 Korn. 4:4). Îsa nêzîkî Erîhayê, du merivêd kor qenc kirin, çimkî “gunê Îsa li wan hat” (Met. 20:34). Hergê em jî anegorî Îsa hewasa xwe hindava merivêd kor didine kifşê, hingê em dikarin lezetê bivînin ji wê yekê, ku karibûn alîkariyê bidin hineka, wekî pêbihesin derheqa Yahowa, yê ku korbûnê wê heta-hetayê bide hildanê.

3. Ça em dikarin merivêd kor di têrîtoriya xweda bivînin?

4. Em çi ders seva xwe hildidn ji mesela Janêt?

5. Rast e em mîna Îsa nikarin merivêd kor qenc kin, lê xemkirina me hindava wan, wê çi kerema bîne?

Çaxê Alîkariyê Didî Merivê Kor . . .

- Çaxê xeber didî, wî binihêre, û dengê xwe bilind neke. Rast e merivêd kor nikarin bivînin, lê ewana rind dibihên.
- Tu dikarî destê xwe dirêjî wî kî, ku ew bikaribe destê xwe bavêje milê te, çaxê hûn rê diçin. Ewê bikaribe pey te here, hergê tu xwe berbi vî digirî û gavêd biçûk davêjî. Çaxê tu divînî ku li ser riya we çal e, heykel e, kevir e yan jî tiştêd din e, ferz e ku wîra bêjî.
- Tu dikarî bidî xebatê xeberêd usa ça “binihêre”. Meriyêd kor jî xeberêd usa didine xebatê. Ewana “divînin” bi cûrekî mayîn, mesele çaxê didine ber çevê xwe ev yek, çi ku kesek wanara şirovedike.
- Li cîkî usada şêwra hev bikin, kîderê ku xewle ye. Gelek car merivêd kor xwe hêsa texmîn nakin li wan ciyada, kîderê ku gelek çûyîn-hatina meriya heye û cîkî nerihet e. Çimkî wanara çetin dibe bizanibin, hela dor-berê wan niha çi diqewime.
- Çaxê tu ji merivê kor diçî, derheqa çûyîna xwe wîra bêje. Çimkî ew dikare berdewan ke xeber de, çaxê tu wêderê nîbî.
- Hergê merivê kor hewasa xwe dide kifşê, lê di têrîtoriya teda najî, hingê tu gerekê tije kî ev blanka lazim (S-43), û bidî sêkrêtar.

HEFTIYA JI 1 HEZÎRANÊ

Kilama 54 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
fg Serê 10 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 2 Samûyêl 16-18 (8 deqe)
№ 1: 2 Samûyêl 17:14-20 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Serhatî 102 (*my*) (5 deqe)
№ 3: Ça Bikin wekî Nekevine nava Problêmêd Perava Girêdayî? (*igw* rûp. 21 abz. 1-4) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 36
10 deqe: Cûrek ji Pêşanînê. Şêwirkirin. Hergê kesek dibêje: "Çira hûn naçin ser mezela?". Cûrek ji pêşanînê, ji serî heta xilaziyê şêwir ke û paşê temaşê nîşan ke.
10 deqe: Hewcêd civatê.
10 deqe: Me Ev Yek Ça Da Xebatê? Şêwirkirin. Bêje guhdara bira caba xwe bidin û bêjin, ku çi kar wana sitand ji xebitandina fikrêd ji gotara "Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Şedetîkirin wan Merivara, yêd ku li ser Zimanê Din Xeber Didin". Bêje guhdara bira qewimandinêd pozîtîv gilî kin.
Kilama 25 û Duakirin

Elametî

Edebyetêd bona belakirinê seva meha **Gulan û Hezîranê:** "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?", yan jî yek ji van belavoka: "Çi Hûn Derheqa Kitêba Pîroz Dişirmîş Dibin?", Halê Dinyayê wê Çawa be?", "Çi Lazim e, seva ku Malbet Bextewar be?", "Kî bi Rastiyê li ser Dinyayê Hukum Dike?", "Gelo wê bê ew Wede, Çaxê Kul-Derd Îda Tune bin?", yan "Gelo bi Rastiyê Mirî Dikarin Dîsa Bijîn?". **Tîrmeh û Tebax:** "Mizgîniya Xwedê seva Meriya", yan yek ji wan broşûra, yêd ku bi 32 rûpêla nin: "Riya Edilayê û Bextewariyê", "Guh Bide Xwedê", yan "Guh Bide Xwedê û Bijî Heta-Hetayê".

Cûrek ji Pêşanînê

Hergê kesek dibêje: "Çira hûn naçin ser mezela?".

Hûn dikarin usa bêjin: "Di vê yekêda tiştekî nerast tune, ku meriv here li ser mezelê miriyêd xwe. Qulixkarêd Xwedêye amin jî, paşî definkirinê diçûne li ser mezel û şîna miriyêd xwe dikirin". (Bixûne yan bi ezberî biwekilîne Yûhenna 11:31). Lê gelek pêxemberêd Xwedê jî, mesele Birahîm, Îbo û Mûsa, bawer dikirin ku mirî ça bêjî raza ne. (Hergê xweyê malêra hewas e, yan jî ew dixwaze xeber de, tu dikarî vekî kitêba "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?", serê 6 û şêwir bikî tevî wî abzasa 18, yan jî tu dikarî evê kitêbê wîra bihêlî).

Paşê tu dikarî zêde kî: "Me xeber da derheqa wê yekê, wekî mirî ça bêjî raza ne, lê heye kesek ku dikare wana hişiyar ke, anegorî dê-bava ku dikarin zara xweye razayî ji xewê rakin. Hûn dixwazin pêbihesin ew kî ye? Cara din, emê evê pirsê şêwir kin". (Cara din tu dikarî tevî wî şêwir kî serê 7, ji kitêba "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?")

Pêşdaçûyîn di Qulixkirinêda

Nava vê salê di mihala meda, seva kîjanî ku fîlîala Gurcistanê cabdar e, nehe civatêd teze û çar kom hatibûn sazkirinê: heyşt li ser zimanê Gurcikî, sisê li ser zimanê Azêrî, yek li ser zimanê Ermenî, û civateke li ser zimanê Kurdî. Bi temamî li ser têrîtoriya me, 288 civat û 50 kom hene. Bira Yahowa berdewam ke qewata me kerem ke, ku em bikaribin şedetî bidine merivêd "ji her miletî, ji her berekê, ji her cimetê û ji her zimanî" (Eyan.7:9).

km15 05-RDU Ga 150204